

Elîfname di Edebiyata Kurdî (Kurmançî) ya Klasîk de*

Alifname in Classical Kurdish (Kurmanji) Literature

Numan YURT

Numan YURT | <https://orcid.org/0000-0002-8921-3939> | numanyurt1@gmail.com
PhD. Candidate at Mardin Artuklu University, Institute of Living Languages in Türkiye,
Department of Kurdish Language and Culture, Mardin, Türkiye

Citation:

Yurt, N. (2024). Elîfname di Edebiyata Kurdî (Kurmançî) ya Klasîk de. *Nubihar Akademî* 21, 35-62. DOI: <https://doi.org/10.55253/2024.nubihar.1491447>.

Submission Date	28.05.2024
Acceptance Date	28.06.2024
Publication Date	30.06.2024
Peer-Review	Double anonymized - Two External
Ethical Statement	It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited.
Plagiarism Checks	Yes - iThenticate
Conflicts of Interest	There is no conflict of interest between the author and any parties in the article.
Complaints	The author(s) has no conflict of interest to declare.
Grant Support	The author(s) acknowledge that they received no external funding in support of this research.
Copyright & License	Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0 .

* Kurteya vê gotarê di Sempozyûma Navneteweyî ya li Ser Ziman, Edebîyat û Zanistên Civakî -1- ya 05.05.2024an de hatîye pêşkêşkirin.

Puxte

Di vê gotarê de wek şêwazeke edebî şeş elifnameyên edebiyata kurdî (kurmancî) hatine danasîn û elifnameya Siyahpoş û Şêx Ehmedê Feqîr bi hûrgilî hatine vekolan. Elifnameya Siyahpoş, Şêx Ehmedê Feqîr, Weda'î û Ce'ferqulî Zengelî mînakên ji qada edebiyata klasîk û bi kurmancî ne. Elifnameya Yûsîfê Terxanî mînakek ji qada edebiyata gelêrî û bi kurmancî, ya Mela Ebdulfettahê Hezroyî ji qada edebiyata klasîk û bi erebî ye. Armanca vê xebatê danasîna elifnameyên kurmancî û vekolîna taybetmendiyên wan e. Bi vê mebestê piştî destpêka xebatê behsa çarçoveya têgihî, mijar, taybetmendî û rêzbandiya elifnameyan herwiha cihê elifnameyan di edebiyata kurmancî de hatiye kirin û şeş elifnameyên edebiyata kurmancî ji hêla rêzbandî û naverokê ve hatine dahûrîn. Taybetmendiyên elifnameya Siyahpoş û Şêx Ehmedê Feqîr jî bi hûrgilî hatine diyarkirin û bi tabloyan şiklê rêzbandiyê hatiye nîşandan. Metnên her du elifnameyan di dawîya xebatê de hatine bicihkirin. Di encama vekolînê de em têdighijin ku helbestvanên kurmanc ji hêla şiklê tertîbê ve elifnameyan rast tercîh kirine. Siyahpoş û Feqîr şêwazeke resen ceribandine ku ev, dahêneriya helbestvanên kurmanc e. Helbestvanên kurmanc elifnameyên xwe li ser hebûn, yekîtî û hikûmranîya Xwedê, pesn û hezkirina Resûlê Xwedê, hin mijarên dînî û evîna beşerî nivîsîne.

Peyvên Sereke

Edebiyata kurmancî ya klasîk, Siyahpoş, Şêx Ehmedê Feqîr, Şêwaza edebî, Elifname.

Abstract

In this article, six alifnames of Kurdish (Kurmanji) literature are introduced as a literary style and Siyahpoş and Sheikh Ehmedê Feqîr's alifnames are analyzed in detail. The alifnames of Siyahpoş, Sheikh Ehmedê Feqîr, Weda'î and Ce'ferqulî Zengelî were written in the field of classical literature and in Kurdish. Yûsîfê Terxanî's alifname was written in folk literature and in Kurmanji, while Mela Ebdulfettahê Hezroyî's was written in classical literature and in Arabic. The aim of this study is to introduce alifnames written in Kurmanji dialect of Kurdish literature and to examine their characteristics. For this purpose, after the introductory chapter, the conceptual framework, subject matter, characteristics and organization of alifnames, as well as the place of alifnames in Kurmanji literature are mentioned and six Kurmanji alifnames are analyzed in terms of organization and content. Subsequently, the subjects of alifnames, their organization, and their place in Kurmanji literature are mentioned, and six examples of Kurmanji literature are analyzed in terms of their organization and content. The characteristics of Siyahpoş's and Fakir's alifnames have been determined in detail and their organization is shown in tables. The texts of both alifnames are included at the end of the study. As a result of the research, we understand that Kurmanji poets preferred flat alifnames in terms of organization. Siyahpoş û Feqîr experimented with an original style, which shows their productivity. Kurmanji poets wrote about the existence, unity and sovereignty of Allah, the love and praise of the Prophet, some religious subjects and human love.

Keywords

Classical Kurdish (Kurmanji) Literature, Siyahpoş, Sheikh Ehmedê Feqîr, Literary style, Alifname.

Destpêk

Tîp di gelek qadên wek bawerî, huner û zanistê de ji bo wateyên veşartî hatine bikaranîn û bûne hêmanekî simbolîzmê. Gelek şaristanîyên wek Misir, Hind û Rojhilata Nêzik di wê baweriyê de ne ku wateyên veşartî û simbolîk ên tîpan hene û bandor li siruştê dikin. Ev bawerî piştî di nav cihûtî, xiristiyanî û îslamiyetê de jî belav bûye. Li nav çanda îslamê ew bawerî heye ku tîp xwedî hin taybetmendiyên veşartî ne. Qur'ana Pîroz yek ji van çavkaniyan e ku tîp bi tena serê xwe wek ayet bi kar anîne û li ser wateya van ayetan bi sedsalan gelek şirove hatine kirin. Hin mufesiran wateya van ayetan şirove kirine hinan jî ji ber ku wek ayetên mutesabîh bi nav kirine xwe ji şirovekirina wan dûr xistine (Duman & Altundağ, 1998, r. 401). Ev bikaranîna ku wek "hurûfê muqette'a" tê binavkirin ji 14 tîpên elîfbêyê pêk tê û 29 sûreyên Qur'anê bi van tîpan dest pê dikin. Qadeke din a ku tîp wek malzemeyekê bi kar anîne zanîsta tîpan/'ilmu'l-hurûf e ku di tesewifa îslamê de yek ji şeweyên herî bîma yê derbirînê ye. Mebest di zanîsta tîpan de raza tîpan e û ebced, cîfr û sistema ebcedê jî bi mebesta ku tîpên elîfbêya erebî bîn jiberkirin hatiye sazîkirin û tîp bi rêzê beramberî jimarekê tên (Bilgegil, 2023, r. 320). Muhyedînê Erebi (w.638) di çarçoveya zanîsta herfan de beşek ji pirtûka xwe ya *el-Futûhatu'l-Mekkîyyeyê* ji bo tekiliya mertebeyên tîpan û mertebeyên hebûnê terxan kiriye û behsa peydabûna alemê, razên besmeleyê, afirandina rih, laş û erdê, erd û hemeleyên erşê, kursî/hukûmranî, çar ferîşte, qutb û mijarên derasayî yên zanistên îlahî kiriye (Kılıç, 1996, r. 252). Fezlullahê Hurûfî (w.796) jî di navbera jimarên û 28 tîpên erebî û 4 tîpên din de tîkiliyek danîbû û bi vî şiklî pergala Hurûftiyê ava kiribû. Hurûftî herfan dixê navenda nêrîna xwe û îddîa dike ku cewhera hemû heyber herf in loma navê wî ji vê nêrîna xwe wergirtiye. Vê pergale hemû kaînat û heyberan, hukmên dînî, ayet, hedîs û hurûfê muqette'ayê li gorî xetên li ser rûyê mirovî şirove kirine (Aksu, 1998, r. 408). Herçend ne Hurûfî bin jî gelek mutesewif di bin bandora nêrîna û şiroveyên vê bizavê de mane û wan di berhemên xwe de peyv û mezmûnên vê baweriyê bi kar anîne (Levend, 2018, r. 64).

Çawa ku tîp di bawerî û qadên zanistî de hatine bikaranîn di huner û edebiyatê de jî bûne malzemeyekî jêneger. Tîp, di merheleya pevbestina helbesta klasîk de jî ji bo derbirîna hest û armanca helbestvanî objeyê serlêdanê ye. Mebest ji van tîpan tîpên elîfbêya erebî ne ku ji hêla şiklê xwe ve ji bo gelek rewş, mezmûn û wateyan bi sedsalan hatine bikaranîn (Tökel, 2010, r. 20). Qadeke bikaranîna tîpan jî hunerên edebî ye ku hunerên wek teşbîh, luxez, muemma û danîna tarîxê bi tîpan re tekildar in. Tîp di ciwankariya teşbîhê de pir caran bûne hêmana muşebbeh/lêçûyê û wateyên curbicur li tîpan hatine barkirin. Ji bo mînak tîpa "elîf"ê ji ber şiklê xwe hem yekîtî/wehdetê hem jî bejna xweşdiviyê dinimîne. Helbestvanan tarîxa jidayîkbûn û wefata kesekî, rûdana bûyereke girîng, tarîxa nivîsîna berhemekê û gelek mijarên din li gorî

hisabê ebcedê diyar dikir. Bikaranîna tîpan ji bo rêzkirina helbestan di nav dîwanekê de kevneşopiyeye edebiyata klasîk e. Helbestên dîwaneke murettib li gorî vê kevneşopiyê li ser bingeha serwayê û serwa jî li gorî rêza tîpên elîfbêyê di dîwanê de hatine bicihkirin.

Hin helbestvanan bi rêya bikaranîna tîpan xwestine ku armanc, hest û ramanên xwe bînin ser zimên an jî huner û behremendiya xwe ya edebî nîşanî xwêneran bidin. Helbestvan di vê şeweyê de bi her tîpekê îşaretî wate, mijar an mezmûnekî dikin û ji nirxa tîpan a sembolîk sûd werdigirin. Elîfname yek ji van şewazên edebî ye ku helbestvan helbesta xwe li gorî tîpan saz dike. Kereste û pîvana sereke ya helbestên bi vî terzî tîp in û ji ber ku qada manevrayê ya helbestvan teng û sînordar e karê wî dijwar e. Digel vê helbestvan armanc dike ku bi navgîniya tîpan bi bal wate û mezmûnên têkildarî mijarê ve îşaret bike herwiha hostayî û behremendiya xwe biselimîne. Rêzkirina tîpên elîfbêyê di malik û bendên helbest an menzûmeyê de taybetiya sereke û berbiçav a şewaza elîfnameyê ye.

Cem Dilçin di pirtûka xwe ya bi navê *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi* de navê elîfnameyê bi kar neaniye û di bin sernavê akrostîşê (muweşşah) de hin mînak ji elîfnameyan daye (Dilçin, 1983, r. 495). Âmil Çelebioğlu di pirtûka *Eski Türk Edebiyatı Araştırmaları* de elîfnameyê wek têgih pênase kiriye, behsa taybetmendiyên elîfnameyan kiriye û navê hin helbestvanên elîfnameyan daye (Çelebioğlu, 1998, r. 605). Mehmet Temizkan lêkolîna xwe li ser 72 elîfnameyan kiriye û bi navê *Türk Edebiyatında Harf Şiirleri ve Elif-nâmeler* çap kiriye (2007). Burhan Kaçar (1997, r. 310-311) û Doğan Kaya (2007, r. 310) li gorî şikilê rêzkirinê elîfnameyan dabeş kirine. Nihat Öztoprak jî elîfnameyan (Öztoprak, 2009, r. 810-823) ji hêla rêzbendî û mijarê ve dabeş kirine.

Digel ku di edebiyata kurdî de xebat li ser mijara elîfnameyê nehatine kirin û wek şewaz tu kesî destnîşan nekiribe jî hin lêkolerên me helbestên bi vî rengî wek mînakên “sembolîzma herfan, herfên hicayê” nasandine. Siyahpoş wek kevneşopiyeye mesnewiyên edebiyata farisî di nav *Seyfu'l-Milûk û Bedî'u'l-Cemala* xwe de 14 helbestan bi cih kiriye da ku yekneseqiya mesnewiyê kêmbike. Ji van helbestan a duyem di çarçoveya hunera îqtibasê de nimûneyeke gelek serkeftî ye û gelek ji me jî vê helbestê haydar in. Abdurrahman Adak ev helbest wek sembolîzma herfên hêcayê destnîşan kiriye. Di Dîwana Şêx Ehmedê Feqîrî de elîfnameyek heye ku ji aliyê şewazê ve dişibe helbesta Siyahpoşî. Hayrullah Acar di vê xebata xwe de wek îqtibasê mînak ji vê helbesta Feqîrî daye lê di heqê vê şewazê de tu şirove nekiriye. Ev şewe ji me re bû mereq û mijara vekolînê. Piştî vekolînê di qada edebiyata Osmanî de em rastî gelek xebatên li ser elîfnameyan hatin. Lêkoleran ji bo helbestên ku di qada edebiyata Osmanîyan de bi vê şewazê hatine nivîsîn têgeha “elîfname”yê bi kar aniye. Îcar me bi vê nêrînê çav li berhemên edebiyata kurdî ya klasîk gerand. Dîsa em bi

xebata Tehsîn Îbrahîm Doskî ya bi navê *Baxê Îremê* jî ji helbesta Yûsîfê Terxanî û Mela Ebdulfettahê Hezroyî jî haydar bûn. Doskî ji bo elîfnameya Terxanî di pirtûka xwe de gotiye ku her parçeyek bi herfekî ji herfên hicayê dest pê dike lê di heqê vê şêwazê de agahiyeke taybet nedaye. Em bi agahdarkirina du hevalên lêkoler ji helbestên Weda'î û Ce'ferqulî Zengelî jî haydar bûn. Li gorî vekolîna me di lîteratûra edebiyata kurdî de heta vêga tu xebat li ser vê şêwazê nehatiye kirin. Loma jî me pêdivî dît ku di edebiyata kurdî de em mînakên vê şêwazê peyda bikin, taybetmendiyên wan vekolin û cihê wê tesbît bikin. Ji ber vê wek mijar û şêwazeke ku em nû pê hisiyane dahûrîna elîfnameyan, diyarkirina taybetmendiyên wan û peyitandina şêwaza edebî ya helbestvanên kurd (kurmanc) giring e.

Di xebatê de taybetmendî û cihê elîfnameyê di edebiyata kurdî ya kurmancî de bi van şeş mînakên navborî hatiye raçavkirin. Piştî agahiyên destpêkê behsa çarçoveya têgihî, mijar û rêzbandiya elîfnameyan herwiha cihê vê şêwazê di edebiyata kurdî de hatiye kirin. Elîfnameyên Weda'î, Ce'ferqulî, Fethî û Terxanî digel taybetmendiyên wan hatine danasîn. Wek nîvenda xebatê, me elîfnameya Siyahpoş û Feqîr jî ji hêla rêzendî û naverokî ve vekolaye û digel tabloyan hewl daye ku manendî û ciyawaziyên wan raxin ber çavan.

Em bi vê xebatê dixwazin ku digel nasandin, mijar, rêzbandî û taybetmendiyên van şeş elîfnameyên edebiyata kurdîya kurmancî aliyekî huner û şêwaza helbestvanên kurmanc nexasim jî şêwaza Siyahpoş û Şêx Ehmedê Feqîrî diyar bikin. Me di maweya vekolînê de xwe gihand şeş elîfnameyên kurmancî û tesîten me li gorî van mînakên navborî ne. Em bawer dikin hin mînakên dîtir jî dê peyda bibin û bîna vekolan. Di vekolîna xwe de me çarçoveya têgehî, rêzbandî/şikilê tertîbê û mijara elîfnameyan di çarçoveya vekolînên edebiyata Osmanî de diyar kiriye. Xebat ji beşa destpêk, sernavên mijar û rêzbandiya elîfnameyan, elîfname di edebiyata kurdî de, elîfnameya Weda'î, Ceferqulî, Fethî û Terxanî, Siyahpoşî û Şêx Ehmedê Feqîrî, encamê pêk tê û helbestên Siyahpoşî û Şêx Ehmedê Feqîrî jî di dawîya xebatê cih digirin.

1. Elîfname, Mijar û Rêzbandiya Wê

Peyva elîfnameyê navekî hevedudanî ye û ji tîpa yekem a elîfbêya erebî "elîf" û peyva "name"ye ya ku tê wateya risale, pirtûk, mektûbê pêk tê (Sami, 2015, r. 1452). Elîfname ji hêla têgihî ve jî ew menzûme ne ku bi elîfbêya erebî di mijarên curbicur de bi teşeyên cuda ku tîpên elfabetîk piranî di serê peyvan de li bin hev tîpên rêzkerin (Güzel & Torun, 2003, r. 335). Li gorî Âmil Çelebioğlu elîfname, digel ku bi şiklên cuda tîpên nivîsîn ew helbest in ku bi giştî ji "elîf"ê heta bi "yê"yê tîpên peyvên serê ristan bi terzekî elfabetîk li bin hev tîp

rêzkirin. Têkiliya tîp û peyv an ne tesadufî ye û bi piranî li gorî naverokê ye. Elîfname berhemên hevpar ên edebiyata dîwanê û gelêrî ne û ji cureyên dînî, tesewîfî û ladinî gelek mînakên wan hene (Çelebioğlu, 1998, r. 605).

Elîfname bi teşeyên wek mesnewî, xezel û qesîdeyan ên di edebiyata dîwanê de; bi destan û dîwanên di edebiyata aşiqan de, bi tewhîd, munacat, ne'î û medhiyeyên di edebiyata dînî-tesewîfî de û di mijarên wek hebûn û yekîtiya Xwedê, lavakirina ji Xwedê re, pesnê ji pêxember û mezinên serdemê re tîp nivîsîn (Güzel & Torun, 2003, r. 335). Pûtepêdaneke taybet di nav elîfbêya erebî de bi tîpa elîfê heye û herwiha wateyên tesewîfî û hunerî lê tîp barkirin. Dikare bê gotin ku elîfname bi rengvedana vê nerînê û bi bikaranîna tîpan tîp nivîsîn û ew helbest in ku di encama bergeha “qîmpêneanîna yên heyî, lêgerîna nûjenî û daxwaza ceribandina teşeyên ciyawaz” a helbestvanan de derketine holê (Tökel, 2010, r. 54).

Gengeşe di heqê huner, teşe yan curebûna elîfnameyê de heye. Hin lêkoler di navbera elîfname û hunera akrostîşê (muweşşah) de hevşibiyekê dibînin (Öztoprak, 2009, r. 817; Kılınç, 2015, r. 217). Cem Dilçin digel ku navê elîfnameyê bi kar neaniye jî di bin sernavê hunera akrostîşê (muweşşah) de hin mînakên elîfnameyê rêz kirine (Dilçin, 1983, r. 495). Mebesta hunera akrostîşê bi rêzkirina tîpan a li bin hev ew e ku peyv an jî hevokeke watedar bi dest bixe. Armanca helbestvanî bi rêzkirina tîpan a di elîfnameyê de ne pêkanîna peyv an hevokeke watedar e. Helbestvan çî di çarçoveya wateyê de çî jî di çarçoveya şiklî de be dixwaze ku tenê bi rêzkirina tîpan û tîkildarî van tîpan kombînyasyonê saz bike. Ji bo navlêkirina vê şeweyê dibêje ku li şûna muweşşahê tercîhkirina navê “elîfname”yê êdî guncan e û ji ber ku gelek mînakên vê şeweyê hene dikare bê gotin ku vê menzûmeyê taybetmendiyeke xweser bi dest xistiye (Öztoprak, 2006, r. 136). Lêkoleran bi yekdemî elîfname wek şewazeke edebî bi nav kirine. Şewaza edebî, şeweya vegotina mijarekê ye û Metin Akkuş şewazê wek pêşkêşkirina şiklê mijarekê pênasê kiriye (Akkuş, 2007, r. 18). Li jorê jî me amaje pê kiribû ku elîfname bi teşeyên cuda û di mijarên cuda de tîp nivîsîn. Loma elîfname ne wek teşe û cureyekî edebî wek şewazeke edebî tê dîtin. Piştî ku elîfname dikevin rojeva edebiyatê gelek lêkoler li gorî şeweyên nivîsînê elîfnameyan dabêş û pênasê dikin. Ji ber ku mînakên wê ji şiklî û mijarên curbicur pêk tîp di heqê elîfnameyan de pênasekirineke vebir zor e.

Şewaze elîfname di helbestê de bi dîtbariyê dide der û berî her tîştî tîpên elîfbêya erebî û peyvên ku bi heman tîpê hatine sazkirin li ber çavê me dikeve. Hin helbestvanan ji hêla şiklê rêzkirina tîpan û bicîhkirina van tîpan di nav helbest an menzûmeyê de yên berî xwe teqlîd kirine. Hinan jî xwestiye ku ji helbestvanên berî xwe kombînyoneke cudatir û resen bi kar bînin. Ev yek jî

dike ku helbestvan şewazeke edebî ya xweser bi dest bixe. Lêkolera li gorî mînakên li ber dest elîfnameyan ji hêla şeweya nivîsîn û mijarê ve dabeş kirine. Em ê di bin vî sernavî di çarçoveya behsa dabeşkirinê elîfnameyan bikin. Burhan Kaçar (Kaçar, 1997, r. 310-311) li gorî şiklê rêzkerinê elîfnameyan wiha dabeş kiriye:

1. Elîfnameyên ku di serê ristê de û ji malikan pêk tên
2. Elîfnameyên ku di serê ristê de û ji çarînan pêk tên
3. Elîfnameyên ku di dawîya ristê de û ji malikan pêk tên
4. Elîfnameyên ku di ser û dawîya ristê de
5. Elîfnameyên ku ji şiklê destanê pêk tên

Doğan Kaya (Kaya, 2007, r. 310) elîfnameyan ji aliyê rêzbendiyê ve wiha dabeş kiriye::

1. Elîf û tîpên din di serê malikê de
2. Elîf û tîpên din di serê çarînê de
3. Elîf û tîpên din di çarînan de bi rêzê di serê ristê de
4. Elîf û tîpên din di dawîya malikan de
5. Elîf û tîpên din di ser û nivê malikan de

Nihat Öztoprak elîfnameyan (Öztoprak, 2009, r. 810-823) ji hêla rêzbendî û mijarê ve bi vî şiklê dabeş kiriye:

Elîfnameyên rast: Di vê cureya elîfnameyê de ji “elîf”ê heta bi “yê”yê tîpên yekem ên peyvên serê ristan bi terzekî elfabetîk li bin hev tên rêzkerin. Pir caran herfa elfabetîk a erebî berî peyva pêşîn tê nivîsîn û daxilî weznê tê kirin. Jêcureyên elîfnameyên rast jî hene: Ên ku serê ristên wan elfabetîk in, ên ku serê malik û çarîneyên wan elfabetîk in, ên ku ji yek an çendîn tîpên elfabetîk di nav ristan de cih digirin, ên ku di risteke wê de herî kêma du yan jî zêdetir peyv ji tîpa serî dest pê dike.

Elîfnameyên çep: Tîpên serê rist an malikan ji “yê”yê heta bi “elîf”ê tên rêzkerin.

Elîfnameyên rast-çep: Serê rist an malikan bi şiklê “elîf-yê-bê-lamelîf...” tê rêzkerin.

Elifnameyên ku serwayên wan bi şiklê elfabetîk hatine rêzkirin: Ew elifname ne ku bi teşeya mesnewiyê û serwayên wan bi rêza elfabetîk hatine nivîsîn.

Elifnameyên ku bi mebesta fêrkirin û şahiyê hatine nivîsîn: Ew elifname ne ku bi mebesta fêrkirina listikeke gelêrî hatine sazîkirin. Di vê şeweyê de tîpên serê ristan li gorî rêza elfabetîk tên rêzkirin û peyva yekem ji bajarekî, peyva duyem ji hunermendekî, peyva sêyem jî ji berhema wî hunermendî pêk tê.

Kaçar û Kaya elifnameyên ji qada edebiyata gelêrî û zêdetir li ser bingeha teşeya nezmê û ji hêla cihê tîpan ve dabeş kirine. Ji ber ku Nihat Öztoprak elifnameyên edebiyata gelêrî û klasîk hem ji hêla rêzbandiyê hem ji hêla mijarê ve vekolaye dabeşkirina wî berfirehtir û guncantir e.

2. Elifname di Edebiyata Kurdî (Kurmancî) de

Bi qasî ku em dizanin wek şewazeke edebî heta niha di edebiyata kurdî ya klasîk de li ser elifnameyan lêkolînek nehatiye kirin. Tehsîn Îbrahîm Doskî helbesteke Yûsifê Terxanî ji bo elifnameyê wek mînak daye û amaje pê kiriye ku ji bilî wî kesên wek Elîyê Herîrî, Mela Ehmedê Nalbend û hinên din jî bi vî adetî ango bi vê şewazê helbest nivîsîne (Doskî, 2020, r. 173). Di nav helbestên Herîrî de yên ku me xwe gihandiyê em rastî elifnameyê nehatin. Lê Doskî wek tîgîh elifnameyê bi kar neaniye û wî gotiye ku li cem helbestvanên kurd ev edetek e. Di lêkolîna xwe de ji qada edebiyata klasîk em rastî pênc elifnameyan û ji qada edebiyata gelêrî jî rastî elifnameyekê hatin. Herçend elifnameya Mela Ebdulfettahê Hezroyî ne bi kurdî be jî ji ber ku helbestvanekî kurd ê klasîk e û bi vê şewazê helbest nivîsiye hewceyî behskirinê ye. Elifnameya Yûsifê Terxanî jî helbesteke gelêrî ye û dikeve çarçoveya kevneşopiya elifnameyê. Ji ber van sedeman em ê elifnameya Weda'î, Ce'ferqulî, Fethî û Terxanî bi kurtasî tevlî hin taybetmendiyên wan bidin nasîn. Elifnameya Siyahpoşî û Şêx Ehmedê Feqîrî du mînakên kurmancî yên serkeftî yên şewaza elifnameyê ne û mijara sereke ya vekolîna me ne. Ji van elifnameyan a ku tê nasîn xezela Siyahpoşî ye. Siyahpoş di vê xezela xwe de ji 32 ayetên Qur'anê hem îqtibasên tam hem jî yên nivçe kiriye ku ev mînakeke gelekî serkeftî û resen a hunera îqtibasê ye. Digel vê, tîkiliya herfên elîfbêya erebî û ayetên Qur'anê di vê xezelê de jî berbiçav e. Piştî ku dîwana Şêx Ehmedê Feqîr derket holê em ji elifnameya wî jî haydar bûn. Hayrullah Acar di xebata xwe de di çarçoveya îqtibasên Qur'anê de hin mînakên vê helbestê destnîşan kirine (Acar, 2016, r. 120) lê di heqê vê şewazê de agahiyeke taybet nedaye. Em texmîn dikin ku hin elifnameyên dîtir ên kurdî dê hebin. Heke hin mînakên din hebin û nîrxandin li ser hemûyan bê kirin hingê mirov di çarçoveya edebiyata kurdî de dikare elifnameyan pênas bike,

taybetmendiye wan raxe ber çavan û şewaza edebî ya helbestvanên kurd tesbît bike.

Em ê nixandina xwe di çarçoveya van her şeş mînanan de bikin. Em bi vê xebatê hevî dikin ku agahiyeke nû li edebiyata kurdî ya klasîk û li kesayeta edebî ya helbestvanên kurd zêde bikin. Piştî van agahiyan em ê bi giştî behsa elifnameya Weda'î, Ce'ferqulî, Hezroyî û Terxanî bikin. Taybetmendiye elifnameya Siyahpoş û Şêx Ehmedê Feqîr jî bi hûrgilî digel tabloyan raxin ber çavan û şewaza wan tevî hevbeşî û ciyawaziyên destnîşan bikin.

2.1. Elifnameya Weda'î

Weda'î (1790-1850) helbestvanekî edebiyata kurdî ya klasîk a dawiya serdema Mîrektiyên e. Navê helbestvan Evdilhemîd û mexlesa wî jî Weda'î ye. Weda'î helbestvanekî xwedî dîwan e û di dîwana wî de 69 helbestên farisî û 37 helbestên kurdiya kurmancî hene. Weda'î digel Mela, Pertew, Eskerî û Nûrî (Mela Nûrullahê Godîşkî) nûnerokî giring ê teşeya rubaîyê ye (Adak, 2019, r. 609). Helbestvan di dîwana xwe de li ser temaya evîne bi teşeya rubaîyê elifnameyek nivîsiye û tîpên elifnameyê bi rêya serwayê di helbestê de bi cih kiriye. Weda'î bi îfadeya "Welehû bi tertîbi hurûfî'l-hîca"yê ya serê rubaîyê me agahdar dike ku ew ê tîpên elifbêyê di helbesta xwe de rêz bike. Qalibê erûzê ye rubaîyê "mefa'îlun mefa'îlun fe'ûlun" e û helbest bi şikilê "aaba"yê hatiye serwakirin. Helbestvan tîp jî li gorî rêza elfabetîk bi şiklê "aaxa, bxbx, ttxt, ssxs..." heta bi tîpa "yê"yê rêz kirine. Ev rubaî jî 28 bendan pêk tê û Weda'î jî bilî rista sêyem di dawiya her çarristê de ji "elîf"ê heta bi "yê"yê tîpeke elifbêya erebî bi kar anîye. Helbestvan di şûna "ك"ê de tîpa "گ" bi kar anîye û tîpa "ج" bi kar neaniye. Çarrista yekem û ya dawî ya rubaîyê wiha ne:

Bi mislê te nihîn mewzûn û zîba
Di libsê etles û xara û dîba
Ez im armancê tîrê qews(i) ebrû
Bike derman birîna min tebîba (Dêreşî, 2012, r. 81)

Meke berbade vî 'umrê kiramî
Li pê eş'ar û ebyatan tamamî
Fered yek du wereq dî reş kirin te
Weda'î bes ke bêhûde kelamî (Dêreşî, 2012, r. 86)

2.2. Elifnameya Ce'ferqulî Zengeli

Ce'ferqulî Zengeli (1799-1894?) helbestvanekî edebiyata kurdî ya klasîk e ji herêma Xorasanê ya Îranê ye. Zengeli di helbestên xwe de mexlesên Ce'fer,

Ce'ferqulî, Ce'ferqulî Zengelî, Ce'ferqulî Bêçare, Ce'ferqulî Endelîb bi kar aniye (Zengelî, 2018, r. 14). Ce'ferqulî di dîwana xwe de bi teşeya rubaîyê li ser evînê elîfnameyek nivîsiye û di elîfnameya xwe de tîpên elîfbêya erebî ji "elîf"ê heta bi "yê"yê rêz kirine. Zengelî ji bilî 28 tîpên erebî tîpên "p, ç" jî bi kar aniye ku bi tevahî dibin 30 tîp. Helbestvan bi rêza elfabetîk ji bo her tîpekê çarîneyek terxan kiriye. Rista yekem a her çarîneyê ji bilî çarîneya yekem bi rêza elfabetîk dest pê dike. Tenê tîpa elîfê û peyva ku bi heman tîpê dest pê dike di rista sêyem de ye û wek parçeyek ji qalibê erûzê de hatiye hesibandin. Tîpên din ne di nav qalibê erûzê de ne. Rubaî bi şiklê "aaaa"yê hatiye serwakirin. Çarîneya yekem û ya dawî ya rubaîyê wiha ye:

Ewwel serê bismîllah dewêjim le rûy zemîn
Wesfê yarê tarîf û le sûre Tîn û Zeytûn
Elîf Ellahû Ekber je cemala te şîrîn
Bilbilê baxê ridwan ya ahûya yûrda Çîn¹ (Ezodî, 2007, r. 112)

Yara min î we refş e ser sînga wê lalezar
Her du çavê wê kildan biryê wê ne qelemkar
Rûyê wê baxê ridwan bejna wê serw û çinar
Ce'ferqulî çav le rê temîşe le intizar (Ezodî, 2007, r. 123)

2.3. Elîfnameya Yûsifê Terxanî

Yûsifê Terxan (w.?) helbestvanekî kurd e ku bi şêwazê elîfnameyê helbest nivîsiye. Yûsifê Terxan di helbesta xwe ya yekem a destxetekê de sernavê "haza bît hirûfu'l-heca" daniye û her sêristeke helbestê helbestê bi tîpeke herfên hecayê dest pê dike (Doskî, 2020, r. 173). Ev helbest ne li ser kêşa erûzê ne jî li ser kêşa kîteyî hatiye nivîsîn û dişibe şêweya edebiyata gelêrî. Helbest ji 29 bendan pêk tê û helbestvan ji tîpa "elîf"ê heta tîpa "yê"yê di her sê ristekê de tîpeke elîfbêya erebî bi kar aniye. Her tîpeke erebî beramberî peyvekê tê ku bi heman tîpê dest pê dike. Terxan hem tîpa erebî hem jî ev peyva ku beramberî wê tê di rista yekem de bi kar aniye. Terxanî helbeta xwe de cih daye mijarên

1 Ev çarîne di berhema bi navê *Le Xakê Xurasanê (Dîwan)* de bi vî şiklî ye:

Evel serê bismilê dewêm le rûy zemînê
Wesfê yarê tarîf bû le sûreyê Wet-tînê
Elîf: Elleh û Ekber je cemalê şîrînê
Bulbulê baxê irem ahûya mîlkê Çînê

Di navbera çavkaniya me û ya pirtûka Weşanxaneyê Avestayê de cudahiya hin peyv û qertafan heye. Dîsa di heman berhemê de tîpên elîfnameyê di nav erûzê de hatiye nîşandan.

wek afirandina alemê, mezinahiya Xwedê, kirina îbadet û emelên qenc, şîretên dînî, bihuşt, dogeh û hwd. Sê rista yekem û ya dawî ya helbestê wiha ye:

Elîfê ku **Allah** bike pê 'elem
Wek di lewhê da gerandî qelem
Xuluqand hijde hezar 'alem (Dorskî, 2020, r. 173)

Yê ku **ya** xelqê bi go ji cema'etê
'Emel bikin bi beyta elîf û bê û tê
Fatîha ji bo ruhê Pêxemberê ummetê (Dorskî, 2020, r. 177)

2.4. Elifnameya Mela Ebdulfettahê Hezroyî

Mela Ebdulfettahê Hezroyî (1892-1975) helbestvanekî kurd ê edebiyata klasîk e ku bi mexlesa Fethî tê nasîn. Fethî dema di 16 saliya xwe de ji bo Hecê li Medîneyê bûye ji helbesta helbestvanekî îlham wergirtiye û wî jî bi heman şêwazê elifnameyeke erebî nivîsiye (Yalar, 2012, r. 467). Ev helbesta erebî ya ku 28 malikan pêk tê di nav helbestên Fethî yên erebî de cih digire. Herçend zimanê elifnameya Fethî ne bi kurdî be jî ji ber ku helbestvanekî kurd e hem ji hêla tesbîtkirina elifnameyan ve hem jî ji bo berçavkirina şêwaza helbestvanên kurd ve giring e. Loma me xwest ku em taybetmendiyên elifnameya Hezroyî raxin ber çavan. Hezroyî di vê helbestê de ji "elîf"ê heta bi "yê"yê her tîpeke elîfbêya erebî bi rêzê di malikekê de bi cih kiriye. Hezroyî ji ber ku tîpa "lamelîf"ê bi kar neaniye elifnameya wî ji 28 tîpan û beramberî van tîpan ji 28 malikan pêk tê. Helbestvan ji bo her tîpekê malikek terxan kiriye û peyva her rista yekem a qesîdeyê bi heman tîpê nivîsiye. Fethî vê rêbazê ji "elîf"ê heta bi "yê"yê şopandiye lê ji tîpa "ط"yê pêve heta dawî di hemû peyvên helbestê de heman tîpê bi kar aniye (Ergin, 2006, r. 122). Ev ristina resen û serkeftî taybetmendî û xweseriyeke din a şêwaza Fethî ye. Mijara vê helbestê pesnê Resûlullah e û malika yekem wiha dest pê dike:

*Dibînim hemû alem pesnê wî dide
Xwezî ez jî layiq bûma wê dîtinê.*

يا لَيْتَنِي أَحْظِي بِذَاكَ الْمَنْظَرِ أَلْفٌ أَرَى كُلَّ الْوَرَى مَدَّاحَهُ
(Dorskî, 2012, r. 26)

2.5. Elifnameya Siyahpoşî

Helbestvanekî edebiyata kurdî ya klasîk Mihemed Cewad e ku bi mexlesa Siyahpoş (?-1831) tê nasîn. Siyahpoş mutesewif û pêgirtiyekî ekola Xalidîtiyê ye. Berhema wî ya sereke ya bi navê *Seyfu'l-Milûk û Bedî'u'l-Cemalê* mes-newîyeke evîni ye û Siyahpoş ji bo ku yekrengiya mesnewiyê kêmbike di navbera cihên muxtelif ên vê mesnewiya xwe de 14 helbest bi cih kirine. Helbestvan têkildarî rûdanan di malika/ên mesnewiyê yê berî helbestan de xwêneran ji naveroka wan agahdar dike. Siyahpoş ji van helbestan a duyem bi şewaza elifnameyê nivîsiye. Berî ku behsa elifnameyê bikin pêwist e ku em berê xwe bidin malikên mesnewiyê yê berî elifnameyê. Lewra Siyahpoş di çend malikên beriya xezelê de xwêner pê dihisîne ku ew ê helbestekê bixe nav mesnewiyê û wan ji xezelê re amade dike. Li gorî ku Siyahpoş dibêje du karakterên mesnewiyê yê bi navê *Seyfu'l-milûk* û *Se'du'l-milûk* ji seydayekî ders werdigirin ku ew di edeb û kemalê de bêminak e, şerîet, terîqet û gelek ilman dizane (Siyahpoş, 2011, r. 48-49). Seyda ji hisabê ebcedê ango sembolîzma herfan hin dersan dide van her du feqiyên xwe. Helbestvan vê rewşê wiha tîne zimên:

Qelem kêşa ji lewhêk saf ez sîm
Elîf û bê û tê heta ku bi cîm

Bi avzêrî nivîsî xettê kûffî
Temam ebced ji yekî ta bi ulûffî

Mi'ellim da bi dest wan lewhê sîmin
Bi carek elîf û bê kirne telqîn (Siyahpoş, 2011, r. 49)

Her du feqî ji seydayê xwe di heqê hin meseleyan û wateya van herfan de pirsan dikin. Helbestvan jî li gorî xwe raza van tîpan şirove dike û berî xezelê êşkere dike ku ew ê xezelêkê bi elifbêya erebî li ser yekîtî û hezkirina Xwedê binivîse:

Mueddeb her du rûniştin muqabil
Ji seydayê xwe pirsîn çend mesail

Çi me'na tê ji "elîf" û ta bi "ya"yê
Ji hubba wehdetê ba wî Xwedayê

Bi dil seyda ji "elîf" û "bê" Siyahpoş
Bi însa kir temamê yek xezel xwoş (Siyahpoş, 2011, r. 50)

Abdurrahman Adak jî destnîşan dike ku Siyahpoş di çarçoveya felsefeya xwe tesewifê de ji sembolîzma herfên hecayê sûd wergirtiye û mebesta wî ji

bikaranîna vê simbolîzmê gihîştina wehdetê ye (Adak, 2014, r. 316). Ev agahî, mijara helbestê û armanca Siyahpoş a nivîsîna vê xezelê diyar dikin.

Teşeya helbestê xezel e û li ser behra hezec a “mefa’îlun mefa’îlun mefa’îlun mefa’îlun”ê hatiye nivîsîn. Helbest ji 19 malikan pêk tê û 29 tîpên elîfbêya erebî bi rêzê hatine bikaranîn. Siyahpoş di xezelê de bi rista “*Siyahpoş xweş nezim anî temamê herfê hecayê*” îfade dike ku wî hemû tîpên elîfbêya erebî di vê xezelê de bi kar aniye. Siyahpoşî tîpên elîfbêyê ji “elîf”ê heta bi “yê”yê bi rêzê di vê xezelê de bi cih kiriye (Siyahpûş, 1999, r. 13; Siyahpoş, 2011, r. 50). Tîpên elîfbêyê parçeyek ji kêşê ne. Elîfnameya Siyahpoşî ji hêla şiklê rêzkirina tîpan ve û li gorî dabeşkirina Nihat Öztoprakî dikeve kategoriya elîfnameyên rast. Malika yekem û ya dawî ya elîfnameya Siyahpoşî wiha ye:

“Elîf” Ellah û la îlahe îlla hû di me’nayê

“Beraet” pîrr mişewweş tê ji xala nuqtêya “ba”yê (Siyahpoş, 2011, r. 50)

Ji “ya” Yewme yekûnunnasu pir xewf û mişewweş tê

Siyahpoş xweş nezim anî temam hurûfê hecayê (Siyahpoş, 2011, r. 51)

Siyahpoş tîpên elîfbêya erebî ji bilî malikên 2, 14, 19em pêve di hemû malikên xezelê de bi cih kiriye. Siyahpoşî di vê xezelê de ji 32 ayetên Qur’anê îqtibas kiriye. Helbestvan ji bo tîpên elîfnameyê ji 28 ayetan îqtibasê kiriye ku her tîpek beramberî ayetekê tê. Ji bo 28 tîpan 28 ayet û ji bo tîpa “ص” ê jî peyva “seda”yê bi kar aniye. 4 îqtibasên mayî jî ne ji bo tîpên elîfnameyê bi kar aniye. Ev 28 tîpên ku bi kar anîne carinan di serê van ayetan de carinan jî di nav ayetan de cih digirin. Helbestvan di ristekê de carinan ji bo tîpekê ayetek carinan jî du ayet bi kar anîne. Me di çarçoveya rêzbandiyê/şikilê tertîbê de tîpên elîfbêya erebî û îqtibasên ku beramberî van tîpan hatine bikaranîn li gorî rêza rist û malikan di tabloyê de nîşan daye.

Rêz/ Malik	Ristên Malikê	Tîpa Elîfbêyê	Ayet/Îqtibas
1	1.	ا	Ellah û la îlahe îlla hû
	2.	ب	Beraet
2	-	-	- ²
3	1.	ت	Tebarek
	2.	ث	Summestewa
4	1.	ج	Wenecmî
	2.	ح	Ha Mîm
5	1.	خ	La xewfun ‘eleyhîm

2 Di vê malikê de ji bo elîfnameyê tîp û îqtibas nehatiye bikaranîn.

	2.	د	Ud'ûnî
6	1.	ذ	Uzkurûnî
	2.	ر	Rehmeten minna
7	1.	ز	Uzlifeti'l-cennet
	2.	س	Selamûn qewlen
8	1.	ش	Weşşemsî
	2.	ص	Seda ³ /Wel-Qur'anî
9	1.	ض	Wedduha
	2.	ط	Ta Ha
10	1.	ظ	Wezzahir
	2.	ع	'Îndehû ecrûn 'ezîm
11	1.	غ	Ġasiqîn
	2.	ف	Fetehna
12	1.	ق	Qul huwallahu Ehed
	2.	ك/ك	Kullu men 'eleyha fanîn
13	1.	ل	Len tenalubîrre hetta tunfiqû
	2.	-	-. ⁴
14	-	-	- / Len teranî ⁵
15	1.	م	Ma kane Muhemmed
	2.	-	-. ⁶
16	1.	ن	Nûn wel-Qelem / Qabê qewseyn
	2.	و	Welleylî
17	1.	ه	Huwelhu/ Nehannefsu
	2.	لأ	La yudî'u ecre'l-muhsînîn
18	1.	ى	Yewme yekûnunnasu
	2.	-	-. ⁷
19	-	-	-. ⁸

Tablo 1. Bikaranîna Tîpên Elîfbêya Erebî di Elîfnameya Siyahpoşî de

3 Ji bo tîpa "ê peyva "seda"yê hatiye bikaranîn û di vê ristê de ayeta "Welqur'anî" heye.

4 Di vê ristê de ji bo elîfnameyê tîp û îqtibas nehatiye bikaranîn.

5 Di vê malikê de ji bo elîfnameyê digel ku tîp tune îqtibasa "Len teranî" hatiye bikaranîn.

6 Di vê ristê de ji bo elîfnameyê tîp û îqtibas nehatiye bikaranîn.

7 Di vê ristê de ji bo elîfnameyê tîp û îqtibas nehatiye bikaranîn.

8 Di vê malikê de ji bo elîfnameyê tîp û îqtibas nehatiye bikaranîn.

Siyahpoş di hin malik û ristan de bi peyvên ku tîpa elifnameyê tê de derbas dibin ahengek saz kiriye. Ev xal li kêleka ahenga dengî dîtbariyekê jî pêşkêş dike. Ev jî taybetiyeke din a elifnameya helbestvanî ye. Ji bo mînak:

Cemala “cîm”ê Wennecmî wek perwane ez sotim
Welê “ha”ên di “Ha mîm”an heyata bi dilan dayê

Xiyala “xa”yê La xewfun ‘eleyhîm kê dîye îro
Ji remza “dal”ê Ud’ûnî beyan ket ew bi inşayê (Siyahpoş, 2011, r. 50)

Me berê amaje pê kiribû ku bikaranîna tîpan di nav helbestê de ne tesaduffî ye û bi wateyê re têkildar e. Ji bo mînak di rista Elif Ellah û la îlahe îlla hû di me’nayê de tîpa “elîf”ê di serê ayeteke sureya Beqereyê de cih digire ku jê re “ayet’el-kursî” tê gotin (Êsî & ûyd, 2011, 43). Siyahpoş tîpa yekem “elîf”a elifbêyê bi tîpa destpêkê “elîf”a Ellah re di çarçoveya wateya ayet û mijara sûreyê de bi kar aniye. Elîf di hesabê ebcedê de beramberê hejmara yekê tê û ji ber ku bê xal e û xêzeke bi serê xwe ye yekîfî/wehdetê dinimîne (Pala, 2014, r. 137). Em dikarin bêjin ku hevterîbiyek di navbera wateya îqîbas an sûreyan de heye ku ev felsefeya helbestê ya Siyahpoşî destnîşan dike.

2.6. Elifnameya Şêx Ehmedê Feqîrî

Şêx Ehmedê Feqîr helbestvanekî (w.?) dîtir ê edebiyata kurdî ya klasîk e ku di nivê duyem ê sedsala 18em û nivê yekem ê sedsala 19em de jiyaye. Feqîr, helbestvanekî serdema Mîrektiyayê e û di vê serdemê de berî ku Neqşebendî li Bakurê Kurdistanê belav bibe serdestiya terîqeta Qadirîtiyê li vê herêmê hebû. Feqîr mutesewifekî ku pêgirtiyekî Qadirîtiyê bû (Acar, 2016, r. 568). Feqîr piştî Melayê Cizîrî û Pertew Begê Hekarî kesê sêyem e ku dîwaneke murettib nivîsiye. Dîwana wî seranser ji tewhîd û ne’tan pêk tê û yekem dîwan e ku nusxeya helbestvanî bixwe gihiştîye ber destê me. Feqîrî elifnameya xwe bi teşeya xezelê û li ser behra hezec a “mefa’îlun mefa’îlun mefa’îlun”ê nivîsiye. Malika yekem û dawî ya ku tîpên elifnameyê tê de derbas dibin wiha ye:

Elefe’l-lahu’l-lezî xelege seb’e semawatî
Beraetun minellahî ji “ba”ê pir mu’emma tê (Acar, 2016, r. 229)

Şebîhî resmê.....gelek îro
Nema min sebr û saman e bide zulfa û qurbatê (Acar, 2016, r 231)

Helbest ji 21 malikan pêk tê û 29 tîpên elifbêya erebî hatine bikaranîn. Elifnameya Feqîrî ji hêla teşeya rêzkirina tîpan ve û li gorî dabeşkirina Nihat Öztoprakî dikeve kategoriya “elifnameyên rast”. Feqîr tîpên elifbêyê ji “elîf”ê

heta bi “nûn”ê bi rêzê nivîsiye û piştî ku “hê” xistiye pêşiya “waw”ê dîsa malikên helbestê bi rêzê heta bi “yê”yê domandiye. Feqîr hemû tîpên elîfbêya erebî ji bilî her şeş malikên dawî di helbestê de bi cih kirine. Feqîr di malika 15em de bi rista “*Ji nezma herfê hecayê dilê Ehmed çi nûr hatê*” bi me dide zanîn ku wî helbestek “bi tîpên elîfbêyê nivîsiye û dilê wî pê ronî bûye”. Feqîr di helbestê de ji 30 ayetên Qur’anê îqtiabas kiriye. Ev ayet carinan bi şiklê îqtiabasa tam in carinan jî wek îqtiabasa nîvçe ango parçeyên ji ayetan e. Helbestvan di ristekê de carinan ji bo her tîpekê ayetekê carinan jî ji heman sureyê du ayetên li pey hev bi kar anîne. Tîpên ku bi kar anîne bi piranî serê ayetan de carinan jî di nav ayetan de cih digirin. Her tîpek di ristekê de û beramberî ayetekê hatiye nivîsîn. Feqîr ji bo tîpa “ح”yê di şûna ayetekê de têgeha “hewamîm” bi kar anîye. Ev têgeh ji bo wan sûreyan tê gotin ku bi tîpên “Ha-Mîm”ê dest pê dikin:

Ji “cîm”a Ce’ele’ş-şemsu diyaen lê çi nûr hil bû

Ji heft “**ha**”ên “**hewamîm**”a heyat û ne’meta zatê (Acar, 2016, r. 229)

Ayeteke îqtiabasê beramberî tîpekê nehatiye bikaranîn û di nav rêza malikên elîfnameyê cih nagire. Ji ber vê yekê herçend tîpên elîfbêya erebî 29 bin jî îqtiabasên ku beramberî tîpan tîpên 28 heb in. Malika ku tîpa elîfnameyê tê nehatiye bikaranîn ev e:

Ela ya Ehmedu mail bike bes tu li alaê

Ji ni’met “Indehu ecrîn ‘ezîm” çê bû ji lezzatê

Feqîr jî ji hêla wateyê ve di navbera îqtiabas an sûreyan de hevterîbiyek sazkerîye ku ev felsefeya wî ya helbestê destnîşan dike. Ji bo mînak Feqîrî ji sûreyê Neml⁹ê bi îfadeya “Dabbetu’l-erd”ê îqtiabasek kiriye û ev îfade wek nîşan û sembola wê saetê/roja qiyametê di xezelê de hatiye bikaranîn:

Ji xemra “xa”ê Xerrûw succeden dil bû birîndar e

Ji “dal”a **Dabbetu’l-erd**ê nîşan û remzê sa’etê (Acar, 2016, r. 229)

Feqîr tîpên ku ji bo ayetê bi kar anîne di hin peyvên din de jî bi kar anîne. Vê bikaranînê bi rêya alîterasyon û asonansê ne di asteke bilind de be jî aheng û musîqiyekê xistiye nav helbestê. Ji bo mînak:

Ji “**lam**”a lem yelid îro we lem yûled muşewweş bûm

Ji “**mîm**”a meleun **min** qewmîhî lewm û **melamatê** (Acar, 2016, r. 230)

Ji “**şîn**”a Şehîdellahu li zatê xwe şehadet da

Ji “**sad**”a **Sad** we’l-î zî’z-zikrî sedaya tê (Acar, 2016, r. 230)

⁹ Neml/82. Dema hatina qiyametê nêzîkî wan bû Em ê ji bo wan ji erdê debeyekî (rêveherekî) derînin ku ew ê bi wan re biaxive: “Bêguman însanan bi ayetên Xwedayê me her bawerî neanîbû.”

Me di çarçoveya rêzbendiyê/şikilê tertîbê de tîpên elîfbêya erebî û îqtibasên ku beramberî van tîpan hatine bikaranîn li gorî rêza rist û malikan di tabloyê de nîşan daye:

Rêz/ Malik	Ristên Malikê	Tîpa Elîfbêye	Ayet/Îqtibas
1	1.	ا	Elefe'l-lahu'l-lezî xeleeq seba' e semawatî ¹⁰
	2.	ب	Beraetun minellahî
2	1.	ت	Tebarekellezî
	2.	ث	Summestewa 'ele'l-'erşî
3	1.	ج	Ce'ele's-şemsu diyaen
	2.	ح	Hewamîm ¹¹
4	1.	خ	Xerru we's-succeden
	2.	د	Dabbetu'l-erd
5	1.	ذ	Fezkurullahe qiyamen
	2.	ر	Rebwetin zatî qerarîn
6	1.	ز	Zuuyine li'n-nasî hubbu's-şehewatî
	2.	س	Fi's-selasile we eglalîn
7	1.	ش	Şehîdellahu
	2.	ص	Sad we'l-i zî'z-zikrî
8	1.	ض	We'd-duha
	2.	ط	Ta-ha
9	1.	ظ	Zehere'l-fesadu fi'l-berri we'l-behrî
	2.	ع	'Elimet nefsun ma eħderet
10	1.	غ	Ĝelebet 'eleyna şîqwetuna
	2.	ف	Feseyekfikehumu'llahu
11	1.	ق	Qed semi'e'llahu
	2.	ك/ك	Kelleme'llahu
12	1.	ل	Lem yelid/welem yûled
	2.	م	Meleun min qewmîhî
13	1.	ن	Nûn we'l-qelemi

10 Îfadeya "Elefe'l-lahu" ne parçeyekî ayetê ye û tê wateya "Ew Xwedayê ku hezkirinê afirandiye." Ayeta "ellezî xeleeq seba' e semawatî" jî sûreyê Mulkê îqtibas e.

11 Di vê ristê de îqtibas nehatiye bikaranîn. "Hewamîm" pirjimariya ayeta "ha-mîm" e û heft sûreyên Qur'anê tîpên qesdkirin ku bi ayeta "ha-mîm" ê dest pê dikin.

	2.	ا	Hemmazin/meşşain
14	1.	و	We qudûrîn rasiyatın
	2.	لا	La tus'el 'en eşhabi'l-cehîm
15	1.	ی	Yewme yus'el 'en zenbîhî însun we cann
	2.	-	- ¹²
16-17 18-19 20-21		-	- / 'Indehu ecrîn 'ezîm ¹³

Tablo 2. Bikaranîna Tîpên Elîfbêya Erebi di Elîfnameya Şêx Ehmedê Feqîrî de

Encam

Şêwaza elîfnameyê di edebiyata kurdî ya klasîk û gelêrî de ji hêla helbestvanên kurd ve jî hatiye bikaranîn. Elîfnameyên Siyahpoş, Şêx Ehmedê Feqîr, Weda'î, Ce'ferqulî Zengelî û Yûsîfê Terxanî bi kurdiya kurmancî û ya Hezroyî jî bi zimanê erebî ye. Elîfnameyên Siyahpoş, Feqîr, Weda'î, Zengelî û Hezroyî mînakên qada edebiyata klasîk in û ya Terxanî jî ji qada edebiyata gelêrî ye. Li gorî vê dikare bê gotin ku kevneşopiya nivîsîna elîfnameyê di nav helbestvanên kurd de jî hebûye. Me di maweya lêkolînê de xwe gihandiye van mînakên navborî lê em di wê qenaetê de ne ku hin mînakên dîtir jî dê hebin.

Elîfnameyên Siyahpoş û Feqîr ji hêla şêweyê ve dişibihin hev. Teşeya her du helbestan xezel e û li ser behra hezê a "mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun"ê hatine nivîsîn. Her du helbestvanan 29 tîpên elîfbêya erebî di helbestên xwe de bi cih kirine û ji bo her tîpekê ristekê yan malikekê terxan kirine. Beramberî tîpan bikaranîna îqtibasên ji Qur'anê hevpariyeke din a her du elîfnameyan e. Ev şêweyeke resen e ku ji bo her tîpekê ayetek hatiye bikaranîn. Helbestvanan hem hunera îqtibasê hem jî ya alîterasyonê di hin cihan de jî çendîn hunerên din bi hev re bi kar anîne û bi vî şiklî di helbestan de hunera îbdâyê jî tê dîtin. Siyahpoş jî "elîf"ê heta bi "yê"yê li gorî rêza elfabetîk helbesta xwe nivîsiye. Siyahpoş di elîfnameyê de ji 32 ayetan îqtibasê kiriye. Feqîr di helbestê de ji 30 ayetên Qur'anê îqtibas kiriye. Her du helbestvanan çend îstîsna ne tê de beramberî her tîpekê ayetekê bi kar aniye. Temaya her du elîfnameyan hebûn, yekîti û serweriya Xwedê ye.

12 Di vê ristê de ji bo elîfnameyê tîp û îqtibas nehatiye bikaranîn.

13 Di van malikan de ji bo elîfnameyê tîp û îqtibas nehatiye bikaranîn.

Enfal/28. "Beguman xelata mezin her li cem Xwedê ye." Ev îqtibas di malika 16em de ye û ne di nav tîpên elîfnameyê de ye.

Weda'î elifnameya xwe li ser temaya evînê û bi teşeya rubaîyê nivîsiye. Rubaîya helbestvanî ji 28 bendan pêk tê û ji bilî rista sêyem di dawiya her çarristê de ji "elif"ê heta bi "yê"yê tîpeke elifbêya erebî hatiye bikaranîn. Helbestvan tîpên elifnameyê li gorî rêza elfabetîk bi şiklê "aaxa, bxb, ttxt, ssxs..." rêz kirine. Weda'î tîpên elifbayê di dawiya ristan de wek serwa bi cih kiriye. Ev şêwe ji şêweya elifnameyên din cuda ye.

Elifnameya Ce'ferqulî bi teşeya rubaîyê ye û temaya wê evîn e. Zengelî di elifnameya xwe de bi rêza elfabetîk ji bo her tîpekê çarîneyek terxan kiriye. Helbestvan digel 28 tîpên erebî tîpên "p, ç"yê jî bi kar anîne ku bi tevahî dibin 30 tîp. Tenê tîpa elifê parçeyek ji qalibê erûzê de hatiye hesibandin. Tîpên din ne di nav qalibê erûzê de ne.

Helbesta Yûsifê Terxan ji 29 bendên sê rist pêk tê û kêşa wê serbest. Şêweya helbestê dişibe şêweya edebiyata gelêrî. Helbestvan di her sê ristekê de tîpeke elifbêya erebî bi kar anîye. Her tîpeke erebî beramberî peyvekê tê û ev peyv di heman ristê de cih digire. Temaya helbestê dîn e û mijarên wek afirandina alemê, mezinahiya Xwedê, edakirina îbadetê û emelên qenc, helal û heram, şîretên dînî û hwd. in.

Mela Ebdulfettahê Hezroyî herçend elifnameya xwe ne bi kurdî nivîsibe jî ji bo tesbîtkirina kevneşopîya nivîsîna elifnameyan a li nav helbestvanên kurd giring e. Hezroyî helbesta xwe ji bo pesn û hezkirina Muhammed (s.x.l.) terxan kiriye. Helbestvan 28 tîpên elifbêya erebî bi kar anîye, ji bo her tîpekê malîkekê terxan kiriye û peyva her rista yekem a helbestê bi heman tîpê nivîsiye. Hezroyî vê rêbazê ji "elif"ê heta bi "yê"yê şopandiye lê ji tîpa "p"yê pêve heta dawî di hemû peyvên helbestê de heman tîpê bi kar anîye. Ev şêweya elifnameyê ristîneke resen e.

Siyahpoş, Şêx Ehmedê Feqîr, Weda'î, Ce'ferqulî Zengelî, Yûsifê Terxanî û Mela Ebdulfettahê Hezroyî ji hêla şiklê tertîbê ve elifnameyan rast tercîh kirine. Weda'î di elifnameya xwe di tîpên elifbêyê li gorî rêza elfabetîk nivîsiye û di serwayê de bi cih kiriye. Siyahpoş û Feqîr bi bikaranîna tîpên elifbêyê bi rêzê digel îqbtasên Qur'anê di seranserê elifnameyê de şêwazeke resen ceribandine û belkî em bikaribin bêjin ku ev, xweserîyeke helbestvanên kurmanc e. Bikaranîna şêweya tîpên elifbêyê yên elifnameyên Weda'î, Ceferqulî, Terxanî û Hezroyî şêwazeke standart e. Ji van helbestvanên kurmanc elifnameyên Siyahpoş û Feqîr li ser hebûn, yekîti û hikûraniya Xwedê ye. Ev jî rengvedana nerîna dînî-tesewîfî ya her du helbestvanan e. Terxanî li ser çendîn mijarên dînî, Weda'î û Ce'ferqulî li ser evîn û Hezroyî jî li ser pesn û hezkirina Resûlê Xwedê elifname nivîsîne.

Çavkanî

Acar, H. (2016). *Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr*. Stenbol: Nûbihar.

Adak, A. (2014). *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*. Stenbol: Nûbihar

Adak, A. (2019). *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*. Stenbol: Nûbihar.

Akkuş, M. (2014). *Klâsik Türk Şiirinin Anlam Dünyası: Edebî Türler ve Tarzlar*. Erzurum: Fenomen Yayınları.

Aksu, H. (1998). *Hurûf-ı Mukattaa. İslâm Ansiklopedisi (18, 408-412)*. Ankara: Türkiye Diyanet Vakfı.

Bilgegil, M. K. (2023). *Edebiyat Bilgi ve Teorileri*. Konya: Salkımsöğüt Yayınları.

Çelebioğlu, A. (1998). *Eski Türk Edebiyatı Araştırmaları*. Ankara: Millî Eğitim Bakanlığı Yayınları.

Dilçin, C. (1983). *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*. Ankara: Türk Dil kurumu Yayınları.

Doskî, T. Î. (2012). *Dîwana Fethî, Mela Ebdulfettah Hezroyî*. Stenbol: Nûbihar.

Doskî, T. Î. (2020). *Baxê Îrem*. (Amadekar: Zahir Ertekin). Diyarbakir: Weşanên Dara.

Duman, Z. & Altundağ, M. (1998). *Hurûf-ı Mukattaa. İslâm Ansiklopedisi (18, 401-408)*. Ankara: Türkiye Diyanet Vakfı.

Ergin, M. C. (2006). "Seydayê Hezroyî Haci Ebdulfettah Yazıcı", Dicle Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi, C. VIII, h.1, Diyarbakır.

Ezodî, E. (2007). *Dîwana Ceferqulî Zengelî û Mecmûaya Şair Ehmed Ezodî*. Bocnurd: Weşanxaneya Azodî.

Êsî, M. H. & Girdarî, M. S. & Bêrkevanî, M. M. (2011). *Wergera Qur'ana Pîroz bi Zimanê Kurdî*. Stenbol: Nûbihar.

Güzel, A. & Torun, A. (2003). *Türk Halk Edebiyatı El Kitabı*. Ankara: Akçağ Yayınları.

Kaçar, B. (1997). *Türk Edebiyatında Elif-Nameler*, V. Milletlerarası Türk Halk Kültürü Kongresi – Halk Edebiyatı Seksiyon Bildirileri I. Ankara: Kültür Bakanlığı Yayınları. s.310, 311.

Kaya, D. (2007). *Ansiklopedik Türk Halk Edebiyatı Terimleri Sözlüğü*. Ankara: Akçağ Yayınları.

Kılıç, M. E. (1996). *el-Fütûhâtü'l-Mekkiye. İslâm Ansiklopedisi (13, 250-258)*. Ankara: Türkiye Diyanet Vakfı.

Kılınç, A. (2015). Mana Medeniyetinin Bir Meyvesi: Elifname, 2. *İslami Türk Edebiyatı Sempozyumu*, rr. 217-224.

Levend, A. S. (2018). *Divan Edebiyatı (Kelimeler ve Remizler Mazmunlar ve Mefhumlar)*. İstanbul: Dergâh Yayınları.

Öztoprak, N. (2009). Elifnamelerin Tertip Hususiyetleri ve Metin Tesisindeki Yeri. *Uluslararası Türklük Bilgisi Sempozyumu Bildiriler 2* (s. 817-829).

Öztoprak, N. (2006). Bursalı Feyzi Efendi'nin Elifnameleri. *İÜ Edebiyat Fakültesi Türk Dili ve Edebiyatı Dergisi*, 35. 17.05.2024, Wergirtin ji 2007c35.pdf (dergipark.org.tr).

Sami, Ş. (2015). *Kamus-ı Türkî*. İstanbul: Çağrı Yayınları.

Siyahpoş. (2011). *Seyfu-l Milûk û Bedîu-l Cemal* (amadekar: Bedirxan Amedî). Stenbol: Nûbihar.

Siyahpûş. (1999). *Çend Xezel û Helbest (Tîpguhêziya ji erebî: M. Reşîr Irgat)*. Stenbol: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.

Tökel, D. A. (2010). *Deneyysel Edebiyat Yönüyle Divan Şiiri*. Ankara: Hece Yayınları.

Yalar, M. (2012). Hazro'lu Abdulfettah Yazıcı ve Şairliği. Çağmar, M. E. Gürhan, V. & Gümüş E. (Ed.). *Uluslararası Silvan Sempozyumu* (459-468), İstanbul: Artuklu Üniversitesi Yayınları.

Zengelî, C. (2018). *Le Xakê Xurasanê* (Amadekar: Mehdî Jafarzadeh & Mehmet Salih Bedirxan). Stenbol: Avesta.

Extended Abstract

Letters are an element that has influenced the religious, social, scientific and artistic life of humanity since ancient times. Some civilizations have attributed meanings to letters according to their way of feeling and thinking, or shaped their way of feeling and thinking with the meanings they attributed to letters. One of the fields that use letters as an artistic material is literature. Poets have used letters in their texts on various occasions as a form of self-expression or as an indicator of their artistry. Letters have sometimes appeared in poems or verses as a material of literary art and sometimes as a cipher of a hidden meaning. A style called alifname was developed as a medium in which poets used the letters of the Arabic alphabet and as a space to display their literary talents. Examples of this literary style can be found in Classical Kurdish Literature as well as in other Islamic literatures.

The aim of this article is to introduce the alifnames written in the Kurmanji dialect of Classical Kurdish Literature and to gain an idea about the literary style of Kurdish poets by revealing their characteristics. During the research process, six elifnames were identified. These elifnames belong to Kurdish poets named Siyahpoş, Şêx Ehmedê Feqîr, Weda'î, Ce'ferqulî Zengelî, Yûsifê Terxanî û Mela Ebdulfettahê Hezroyî.

Alifname is a literary style based on the use of the letters of the Arabic alphabet in general order in a text. The first thing that catches the eye in elifname is the visuality/visibility that the letters reflect in the text. It is seen that the letter in the sequence has a visual and sometimes both a visual and semantic connection with the word or words in the verse, couplet or lines of the poem. The poet can use this literary style in any verse form and place the letters of the alphabet in different combinations in his poem or verse. Some of these combinations include placing the letters in alphabetical order at the beginning of the first words of the poem, using them in the inner words or as rhyme. Poets can imitate their predecessors or try to continue the tradition of writing elifnames by experimenting with different combinations to create their own unique style. Alifnames, which are products of classical and folk literature, can be written on religious as well as non-religious topics, such as the existence and unity of God, the supplication to God and the praise of the Messenger of Allah, and many more.

In the study, after mentioning the way letters are used in elifnames and the subjects of elifnames, some information about elifnames in Classical Kurdish Literature is given. The elifnames of Weda'î, Ce'ferqulî Zengelî, Yûsifê Terxanî û Mela Ebdulfettahê Hezroyî are introduced in general terms and their characteristics are explained. Since the basis of the research is based on Siyahpoş and Feqîr's elifnames, the elifnames of the mentioned poets have been

analyzed in detail in terms of form and the themes of these alifnames have been mentioned. The combinations of Siyahpoş and Feqîr's alifnames, the way they form the letters, and the verses and words that the letters are related to are shown in two separate tables.

The elifnames of Siyahpoş, Şêx Ehmedê Feqîr, Weda'î, Ce'ferqulî Zengelî, and Mela Ebdulfettahê Hezroyî are examples of classical literature. Yûsîfê Terxanî's poetry is written in the style of folk literature and in free meter. Except for Hezroyî's alifname, which is written in Arabic, the others are written in the Kurmanji dialect of Kurdish. The reason for including the one by Hezroyî in this study is that he is also a classical Kurdish poet, a follower of this literary tradition and uses this style. Siyahpoş and Feqîr are poets of the same historical and literary period. Although we do not have any definite information about the influence of one of the two poets on the other, their alifnames are very similar. Because both of them used a verse for each letter in their alifnames and sometimes quoted from the same verse. In terms of theme, Siyahpoş and Feqîr's poems are about the existence, unity and sovereignty of Allah. The theme of Weda'î and Zengelî's poems is love; Hezroyî's ode is in praise of the Prophet. Weda'î's alifname is written at the end of a verse and in rhyme. The other elifnames fall into the category of plain elifnames in terms of the way they are written.

We believe that the findings we have made about the Kurmanji alifnames subject to the research have revealed the literary style and poetics of some Kurdish literature representatives, albeit to some extent. We think that by analyzing other alifnames written in this field, we will be able to gain new information about the literary style of the poets of Classical Kurdish Literature.

PÊVEK

Elifnameya Siyahpoşî

- 1 “Elif” Ellah û La Îlahe Îlla Hû¹⁴ di me’ nayê
Beraet¹⁵ pîrr mişewweş tê ji xala nuqtêya “Ba”yê
- 2 Tecellaya cemala Heq wek perwane ez sohtim
Me xef kir ew şîrînesrar çu deng û hîs ji min nayê
- 3 Tebarek¹⁶ xwendî herfê “ta” ji husnê ehse nê dilber
Wek Summestewa¹⁷ remzek qelem da nuqtêyên “sa”yê
- 4 Cemala “cîm”ê Wennecmî¹⁸ wek perwane ez sotim
Welê “ha”ên di “Ha mîm”an¹⁹ heyata bi dilan dayê
- 5 Xiyala “xa”yê La xewfun ‘eleyhîm²⁰ kê dîye îro
Ji remza “dal”ê Ud’ûnî²¹ beyan ket ew bi inşayê
- 6 Ji “zal”a Uzkurûnî²² gerçî dil sohtî qewî îro
Ji “ra”yê “Rehmeten minna²³ heyata cawîdan dayê
- 7 Binê “zeyn”ê çî reng Uzlifeti’l-cennet²⁴ bi me’nê da
Selamûn qewlen²⁵ go “sîn”ê di remza wê mi’emmayê
- 8 Şu’aya “şîn”ê Weşşemsî²⁶ wek perwane ez sohtim
Sedayê “sad”ê We’l-î²⁷ çû heta bi cewzayê

14 Beqere/255. Allah Teala ye, (yê ku) ji Wî pê ve tu Xweda nînin.

15 Tewbe/1. Ev ji aliyê Xwedê Teala û Pêxemberê wî ve bêrbûn û derketineke ji peymanê ye ji bo wan muşrikên ku we bi wan re peyman daniye.

16 Mulk/1. Ew Xwedayê ku xwedanî û fermandarî di destê wî de ye pak û pîroz e û li ser her tiştî kara ye.

17 Beqere/29; Hedîd/4; Secde/4; Re’ d/2; Furqan/59; Fussilet/11.

18 Necm/1. Sond bi stêrkê.

19 Mu’ mîn/1., Fussilet/1., Şûra/1., Zuxrûf/1., Dûxan/1., Casiye/1., Ehqaf/1.

20 Yûnis/62. Ji bo wan tîrs tune ye.

21 Xafir/60. Ji min re dua bikin.

22 Beqere/152. Min bibîr bînin.

23 Yasîn/44. Ji me dilovanî heye.

24 Qaf/31. Bihuşî hatiye nêzîkirin.

25 Yasîn/58. (Ji Xwedayê dilovan) Silav heye.

26 Şems/1. Sond bi rojê.

27 Yasîn/2. Sond bi a Hekîm be; Qaf/1. Sond bi a Mecîd be.

- 9 Çi xoş **“dad”**ê wezû bestim di zewê **“Wedduha”**ê²⁸ da
Tehûr bû dil bilaşibhet bi herfê **“ta”**yê **“Ta Ha”**yê²⁹
- 10 Zihûr kir **“za”**yê **Wezzahir**³⁰ micellayê ser ewraqan
Ji **“eyn”**ê **Îndehû** ecrûn ‘ezîm³¹ danî di tuxrayê
- 11 Ji **“geyn”**ê **ġasiqîn**³² îro eger çî dil bi azar im
Miferreh tê dilê ‘aşîq ji wê **“fa”**ê **Fetehna**³³yê
- 12 Ji **“qaf”**ê **Qul** huwallahu Ehed ³⁴cana çî mektûb e
Digel **“kaf”**ê di **Kullu** men ‘eleyha fanîn³⁵ îmzayê
- 13 Ji **“lam”**ê **Len** tenalubîrre hetta tunfiqû³⁶ îro
Me can û milk û dil bexşîn di rêya wê simensayê
- 14 Ji bo dîn me pirsek kir cewaba Len teranî³⁷ da
Ji dil sotim gelî yaran ji dest nûrên şekerxayê
- 15 Binê **“mîm”**ê di **Ma** kane Muhemmed³⁸ da çî nîşan kir
Çî cah û mensebek çêbû nezer den ehse nê esmayê
- 16 ‘Eceb **“Nûn”** wel-Qealem³⁹ min dî di remza Qabê qewseyne⁴⁰
Ji **“waw”**ê **Welleylî**⁴¹ îro şefe q da nûr û rohnayê
- 17 Ji **“ha”**ê jî **Huwelhu**⁴² tê **Nehannefsu**⁴³ bi me’ne da
Ji **“lamelîf”**ê **La** yudî’u ecre’l-muhsînîn⁴⁴ dayê

28 Duha/1. Sond bi danê sibehê.

29 Taha/1. Ev her du tîp ji “hirûfê muqette’a” ne.

30 Hedîd/3. Ellah Zahir (berçav, diyar) e.

31 Tewbe/22, Texabun/15, Enfal/28. (Li cem Xwedê) xelateke mezin heye.

32 Feleq/3. Ji xirabiya şeva reşetarî.

33 Fetih/1. Bi rastî me deriyê serkeftineke aşkera û mezin ji bo te vekir.

34 Îxlas/1. Bibêje Xwedê her yek e.

35 Rehman/26. Her tiştên ku li ser erdê hene fanî ne.

36 Alî İmran/92. Heta ku hûn ji ya ku jê hez dikin xerc nekin hûn ê negêjin xêra herî qenc.

37 E’raf/ 143. (Xwedê got) Tu min nabînî.

38 Ehزاب/40. Muhemmed ji zîlamên we ne bavê kesî ji we ye.

39 Qealem/1. Nûn, sond bi pê nûsê û yên ku rêzerêz dinivîse.

40 Necm/9. Bi qasî du kevanan...

41 Leyl/1. Sond bi şevê.

42 Beqere/120. Bibêje: Bêguman rêberiya rast tenê ya Xwedê ye.

43 Nazi’at/40. Heçî ku xwe ji nefsa xwe dabe paş.

44 Hûd/115. Xwedê xelata qencîkaran wînda nake.

- 18 Ji “**ya**” Yewme yekûnunnasu⁴⁵ pir xewf û mişewweş tê
Siyahpoş xweş nezim anî temah hurûfê hecayê
- 19 Me xwar camek şeraba xoş ji destê saqiyê mehweş
Wek min hişte Îran û berê xwe da Bexdayê

Elifnameya Şêx Ehmedê Feqîrî

- 1 Elefe'l-lahu'l-lezî xeleqe seb'e semewatê⁴⁶
Beraetun minellahî⁴⁷ ji “**ba**”ê pir mu'emma tê
- 2 Tebarekellezî⁴⁸ taê tewekkul da me dil-rîşa
Summestewa 'ele'l-'erşî⁴⁹ ji herfa “**sê**” muradatê
- 3 Ji “**cîm**”a Ce'ele's-şemse diyaen⁵⁰ lê çi nûr hil bû
Ji heft “**ha**”ên hewamîm⁵¹a heyat û ne'meta zatê
- 4 Ji xemra “**xa**”ê Xerrûw succeden⁵² dil bû birîndar e
Ji “**dal**”a Dabbetu'l-erdê⁵³ nîşan û remzê sa'etê
- 5 Ji “**zal**”a Fezkurullahe qiyamen⁵⁴ jê çi dewlet hat
Ji “**ra**”ê Rebwetin zatî qerarin⁵⁵ dil bi heseratê
- 6 Ji “**zeyn**”ê Zuyyine li'n-nasî hubbu's-şehewatî⁵⁶
Ji “**sîn**”a Fî's-selasîle we eglalîn⁵⁷ musemmatê

45 Qarî'e/4. Ew roj e ku însan dibin wek pîropîrokên belavbûyî.

46 “Elefe'l-lahu” Ew Xwedayê ku hezkirin çêkiriye. Mulk/3. Ew Xwedayê ku heft tebeq asîman çêkiriye.

47 Tewbe, 9/1. (Eva han) bêrîbûneke (hişyariyeke) ji aliyê Xweda ve.

48 Mulk, 67/1. Ew (Xweda) pîroz e.

49 E'raf/54. Paşê ser text vegirt.

50 Yûnis/5. Ewî, tav ronahî çêkiriye.

51 “Hewamîm” îşaret e bi sureyên Qur'anê yên ku bi “Ha-mîm”an dest pê dikin.

52 Secde/15. Secde dibin.

53 Neml/82. (Em ê ji bo wan ji erdê) debeyekî/rêveherekî (derfîn).

54 Nîsa/102. Ji Xweda re şîpiya zikir bikin.

55 Mu'mînûn/50. (û Me wan) li deverekî bilindê rast (ê bi av û kanî) niştecih kirin.

56 Alî 'Îmran/14. Hizkirina dilbijênan di çavên mirovan de hatiye xemilandin.

57 Xafir/71. Qeydên hesinî û zincîr.

- 7 Ji “**şîn**”a Şehîdellahu⁵⁸ li zatê xwe şehadet da
Ji “**sad**”a **Sad** we’l-î zî’z-zikrî⁵⁹ sedaya tê
- 8 Bi “**dad**”ê We’**d-duha**⁶⁰ nûrek ku derkefte ji dil xuya
Ji “**ta**”a taê **Ta-hayî**⁶¹ tehûr kir dil ji mir’atê
- 9 Ji “**za**”ê der zehere’l-fesadu fi’l-berrî we’l-behrî⁶²
Ji “**eyn**”ê ‘elîmet nefsun ma eħderet⁶³ we ...
- 10 Ji “**ğeyna**” fi ğelebet ‘eleyna şîqwetuna⁶⁴ dilber
Bi “**fa**”ê feseyekfikehumu’llahu⁶⁵ kifayatê
- 11 Bi “**qaf**”ê qed semî’e’llahu⁶⁶ nîdaa zatê nûrîn e
Bi “**kaf**”ê kelleme’llahu⁶⁷ li Mûsa bi kelîmatê
- 12 Ji “**lam**”a lem yelid⁶⁸ îro we lem yûled⁶⁹ muşewweş bûm
Ji “**mîm**”a meleun min qewmîhî⁷⁰ lewm û melamatê
- 13 Ji **nûn** we’l-qelemî⁷¹ remzek bûye zahir ji elwahan
Ji wê “**ha**”a di hemmazîn⁷² we meşşain⁷³ ji zulmatê
- 14 Ji “**waw**”ê we qudûrîn rasiyatî⁷⁴ lê çi qikmet bû
Ji “**la**” la tus’el ‘en eşhabi’l-cehîm⁷⁵ şikayatê
- 15 Ji “**ya**”ê yewme yus’el ‘en zenbîhî însun we cann⁷⁶
Ji nezma herfê heycaê dile Ehmed çi nûr hatê

58 Alî ‘Îmran/18. Xwedê şahdeyî da.

59 Sad/1-2. Sad! Sond be, bi vê Qur’ana ku xwedan pend û şîret e.

60 Duha/1. Bi danê sibehê; dema roj tîrêjên xwe berdide ser erdê sond be.

61 Ta-ha/1. Ta-Ha.

62 Rûm/41. Xerabî li bej û behrê xuya bûye.

63 Tekwîr/14. (Wê çaxê) Her kes dê bizane ka çi ji bo xwe amade kiriye û çi biriyê (axretê).

64 Mu’minûn/106. (Ew dê bibêjin) Xwedayê me! Xerabiya me serî ji me stand.

65 Beqere/137. Êdî Xwedê li hember wan besî te ye.

66 Mucadele/1. Xwedê helbet seh dike.

67 Nîsa/164. Bê guman Xwedê (bi Mûsa re) peyiviye.

68 Îxlas/3. Kes jê çênebûye.

69 Îxlas/3. û Ew jî ji kesî çênebûye.

70 Hûd/38. Giregirên ji qewmê Wî.

71 Qelem/1-2. Nûn. Bi qelemê.

72 Qelem/11. (Ew ê) devavêj.

73 Qelem/12. (Ew ê) eybderêx.

74 Sebe’/13. û dîzên (di erdê de) cihgirtî (çêdikirin).

75 Beqere/119. Tu yê ji rewşa dojehîyan ne berpirsiyar bî.

76 Ew roja ku însan û cin ji kirinên xwe têne lêpirsîn.

- 16** Ela ya Ehmedu⁷⁷ mail bike bes tu li alaê
Ji ni'met 'Inde(hu) ecrîn 'ezîm⁷⁸ çê bû ji lezzatê
- 17** Dilê Ehmed kete bende ji şewqa va 'ibarata
Qewî min dî meded şewqek şebîhê nûrê mir'atê
- 18** Şebîhî şuşeya şem'ê ji berqa her du ebrûyan
Ku dil mest im bi vê zewqê ji hewla sirrê sa'etê
- 19** Ji hewla mehşerê îro me kir zarî ji vê xewfê
Bibegşe min bi 'efwa xwe dikim zarî bi ze'qatê
- 20** Dikim zarî ji dil her dem bide rehmê tu ya Barî
Meded ya Reb bide feyde li dil şubhê munacatê
- 21** Şebîhî resmê.....gelek îro
Nema min sebr û saman e bide zulfa û qurbatê

77 Hişyar be ey Ehmed!

78 Enfal/28. Bêguman xelata mezin her li cem Xwedê ye.